

“Ez tu carî naxwazim berhemên min bi nasnameya jinî were pênamekirin.” Hevpeyvîn bi Yildiz Çakar Re

Röportajı Yapan: Kürd Araştırmaları

Yildiz Çakar nivîskareke kurd çalak û zîrek e, di gelek cûreyên edebiyatê de berhem dane. Ev çend sale li Almanyayê dijî piranî li ser tekstê şanoyê dinivîse. Berhemên wê li gel gelek zimanan wek Îngîlîzî, Almanî, Erebi, Tirkî hatiye wergerindan. Wek nivîskareke kurd li kamuya edebiyata dinê pê de pê de tê naskirin. Li ewropa deng daye. Em bi Yildiz Çakar re ser xebetên wê yên nû, rewşa edebiyata dinyayê peyîvin.

Pirs: *Ev demeke hûn li Elmanya dijîn. Bi awayekî durrî rojeva edebiyata kurdî yî. Qet nebe rû bi rû nav de nînî. Gelo li wir edebiyata kurdî çawa dixuye?*

Bersiv: Ev nêzî sê sal e li Elmayayê me. Esil ji rojeva wêjeya Kurdî ne durr im. Di serdemeke ya dijîtal de êdî mirov ne mumkun e ji rojeva heyî durr be. Mesela rû bi rû jî rastî ji bilî bêrikirina diya xwe, heval û hogiran, qerejdx û goristana ku miriyê me lê ye pê ve tu tiştê ji min kêmkir, heta lê zêde kir. Ji ber ku tiştên ku mere her carî di ber re diçe û tê carinan nabînî, an dibîne ferq nake, niha durrî bîranînan dike dewrê. Ev mekanîzma pirtir tiştê nîşanî mera dide. Loma jî rewşa ku em tê de ne li gor perspektîva durrîyê karim wiha bibêjim; di xelesa welatê de îsal her ku rewşa awarte ya coronayê hebû jî di warê berhemana da geşbûnek çêbû. Lê nizanîm bo xwendinê jî ev geşbûn çêbû an na? Ev serdem diviya bû sed-dusêd sal berê pêk bihata. Ji ber ku niha rewşa em tê de ne dişibe serdemên borî yên gelek welatan. Loma jî gav bi gav em jî serdemên xwe çêdikin, dijîn û tê re derbas dibin her çiqas gelek bi derengî be jî.

Lê mijar eger qada navnetewî be vê gavê mixabin xûya nake. Ji ber ku hîn li welatê xwe baş naye nas kirin, naye dîtin. Pergaleke me ya ku bo edebiyata me li vir bide xûyakirin tune ye. Her çiqas carinan yek-du navên nivîskar an hunermendan hebe jî, hîn toreke ku wêjeya Kurdî bide nîşandan tune ye. Wergerên me tune ne. Saziyên me yên ku bi saziyên navnetewî re kar bikin tune ye. Ger hebe jî heta niha min qet nebihîstiyê. Bo xûyakirin, bo çêkirina bandorekî biqasî berhe-man wergêr divê hebe. Ev jî ne bi kesan, an bi hewldanên nivîskaran, bi saziyan divê were kirin. Bo van saziyana hewcedarî ji aboriyê re heye, ji tekiliyan re heye, ji diplomasiya çand û hunerê re heye.

Dema em bala xwe didin saziyên elmanan em dibînin him devlet ji aboriya giştî him jî her sal her eyalet butçeyek bo çand û hunerê vediqetîne. Û ev butçe hemû saziyên xwedîpilan û proje ne tene belavkirin. Çerxa wan ya aborî ewqas bi tekûz hatiye ava kirin, ji her cûre kar û barên wêje, huner, werger, bername, festival, pêşbirk, xelat û hwd re tê belavkirin. Ev çerxa çand û hunerê ne tenê ji bo karên navxweyî herwiha ji bo derveyê welat jî bi hêz e. Ji ber ku tora wergerê de pir bi hêz in. Akademiyên wan yên weke Institutiya Goethe ku niha li dinyayê ez bawer dikim biqasî 120 welatan (belkî zêde be jî) kar û barên çand û hunerê dikin.

Gelek welat bi saziyên ziman, çand û hunerê karên “dîplomasiya kamûyê” dikin. Kî bi rexistin û bi hêz be di vî warî de, bandora wan li ser civakan çêdibe. Ev bandor biçim û biryarê dide.

Ji Fransayê bigre Îtalya, Elmanya, Îspanya, Amerîka, heta ji sala 1904an û vir ve Japonya û hwd. jî dîplomasiya civakî dikin. Di çarçoveya “dîplomasiya kamûyê” de herçiqas weke “enstituyên kultirî” kar were kirin jî, di bingeha xwe de belavkirina fikr û ramanên îdeolojîk jî hene.

Tu diçî li welatek saziya xwe li wir ava dikî. Ewil zimanê xwe hîn wan dikî. Dawî ji zimanê wan wergeran, bernameyan, festivalan, organizasyonên navnetewî çêdikî. Li cihek tu him çanda wan, wêjeya wan, zimanê wan nas dikî. Ser de tu zimanê xwe, çanda xwe û wêjeya xwe bi vê rêyê dibî wir û li wir belav dikî. Tu dikarî pirtûkek bi elmanî li ser van saziyana wergerînê 120 zimanan. Îjar qeweta te li ser 120 zimanan hebe tu yî bandora xwe li dinyayê bike. Fikrê te, ramanên te wê jî ser 120 welatan were û bikeve mala te. Ger ji min bipirsîn ezê bêjim “hêz” ev e. Û ev hêz kare biçimê bide gelek tiştan. Ev mijareke gelek fireh e û girîng e, bi çend hevokan mirov belkî nikaribe hurgilî behs bike. Ji bo van xebatana hêzeke mezin lazime. Îjar bifikire hîn zarokên kurdan nikare bi zimanê dayika xwe perwerdehî bibîne. Hîn pirtûkeke kurdî ku çapa xwe ya ewil ya di navbera hezar û du hezarî de nikare biqedîne. Ji ber ku xwendevan tune ye. Ji ber ku milletê kurd erê bi zimanê xwe dipêyive lê bi zimanê xwe nizanin binivîsin û bixwînin. Ji bo pêşketin û belavbûna hertiştêk derbarê kurdan de hewcedariya me ya ewil

perwerdehiya bi zimanê dayikê heye. Karim wiha bibêjim mileteke di warê çand û hunerê de ger xwedî hêz be di siyasetê de jî dibe xwedî hêz. Hêza me ya afirîner heye lê mixabin îro xûya nake. Ji bo xûya bike pirên me, saziyên me hîn tune ne.

Civata edebiyata kurdî wek edebiyatê din li ser hinek meselan di-axive, hinek mesele dibin sedema gengeşiyên tund, gava mirov biv-çavêkî dûr ji menzileke dûr meselê binêre ev mijarên me an niqaşên me çawa dixwiyên?

Weke civaka edebiyata kurdî yê dinyayê jî li ser hin meselên navxweyî gengeşiyên tund dikin. Gelek cih û welatên cûda rastî niqaşên balkêş hatime. Lê di van niqaş û gengeşiyên mezin de min bi qasî ku kurd dijminahiyê hev dikin tu dijminahiyek di nava gengeşiyeye de nedîye.

Bi min dijminê me toximeke bi jehr avêt nava me û ev toxim weke laflafokek xwe li rûhê me pêça. Loma jî em tehamulê hev nakin, em ji hev hez nakin. Van salên dawîn parçeyên ku bi tu awayê li me nayê em dixwazin bixwe ve pîne bikin. Êrîş kirin, hevdû pîskirin, hevdû redkirin. Li ser axa me aşeke bi çav nayê dîtin hatiye avakirin. Di vê aşê de fikr, raman, huner, wêje hema tê hêrandin. Weke hêrandina Heskîfê... Loma jî mijarên me her dem li dora çend tiştan de digere, lê tu encam jê dernakeve. Hema li ser ziman heta îro bi dehan proje hatine çêkirin, bi dehan platform hatine avakirin lê ka em bi hev re li encamê binêrin çi derketiye holê. Hîn di qada ziman de gotina me ne yek e, em hîn di wê qadê de jî parçe parçe ne, îjar mijarên me yê li ser azadî, nasname û hwd ew jî heman aqûbetê dijî.

Li ser van mijaran di niqaş û gengeşiyên me de dev ji encameke erenî berde, di dawî de gengeşî dibe "ricm kirin". Biqasî xelkê em wêje û hunerê napeyivin. Dema em dipeyivin esasên me ne li ser pîvana wêje û hunerê ye, li ser şexs û siyasetê ye. Helbet em karin siyasetê jî niqaş bikin, li ser bipeyivin lê rê û rêbazên me wê rê û rêbazên wêje û hunerê be, an wê rêbazên siyasetê be. Wêje û huner her daim pêwîstiya wê ji aborî û piştgiriyê re heye. Lê pêwîstiya wêje û hunerê ji qaliban û ji sînoren çêkirî re tune ye ji azadiyê re heye.

Me te bi helbestan naskir, piştire roman, çîrok niha hin xebetên şanoyê, ev berhemdariyê li nav cureyên cûda tesîreke çawa li ser afirêneriya te dike, yanê barê te giran dike an sivik dike..

Her çiqas peyvek bi kilasîk be jî helbest ji zarokatiya min de hebû û heta îro jî her bi min re dijî. Lê mesela min û wêjeyê bi senaryoyê dest pê kir. Dema min helbest dinivîsand, neketim wê tatêlê ta ku helbestên xwe biweşînim an çap bikim. Lê salên 2000-2001ê pêşbirika çîrokên senaryoyê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê û pêşbirika çîrokên Tîrêjên Zînê hişt ku ez çîrokên xwe yê ewil û

senaryoyê binivîsim. Tenê şevêk, di nava çend saetan de min deh rûpel çîrokek nivîsand. Ji ber ku dema haya min ji pêşbirka NÇMê çêbû zêde dema min tune bû. Çîroka vê mijarê jî wiha bû: Rojek şair Îlhamî Ozer hatibû rojnamê. Destê wî de zerfêk hebû. Hat ba min go, ez dixwazim vê çîrokê tu ji min re bikşînî ser kompîtirê. Ji ber ku wê çaxê kompîtir pir nedihat peyda kirin. Min go bila û min û hevalek çîroka wî kişand ser kompîtirê. Di dema kişandinê de hin dialogên me li ser çîroka wî çêbû..Ev dialog hişt ku ez wê rojê di nava çend saetan de çîrokeke ya senaryoyê binivîsim.

Piştî min çîroka wî qedand min adresa peşbirkê jê xwest. Û piştî wî runiştim li ber wê kompîtirê bê sekan di nava çend saetan de min deh rûpel çîroka senaryoyekî nivîsand û serê sibê jî min da postê. Piştî wextek min ji bîr kir heta ku mamoste Îlhamî ji min re diyariyek şandibû û hatibû rojnamê, wiha haya min jê çêbûbû ku xelatê dane min. Beriya vê û piştî vê di van salana de du roman û gelek çîrok min nivîsand. Lê min hîn van nivîsên xwe yê van salana çap nekirine. Romanekê min î bi navê “xeyal firoş” heye ku ezê kengî çap bikim nizanim. Îjar mesela roman, çîrok û şano hemû di cihekî de digêjin hev. Min di van du salên dawîn de 5 şano nivîsandin.

Helbestên min rêya şanoyê ji min re vekir. Di civîneke ya li şanoya Maxîm Gorkî de, derhênerêk li ser helbestên min axivî û go helbestên te gelek li şanoyê tê. Û xwestin ku helbestên min bikin şano. Lê min xwest ez tişteke nûh biceribînim. Loma jî beşdarê laboratuvara şanoyê ya navnetewî bûm. Li ser şano û dramayê beşdarê gelek atolyayan bûm, li gelek deverên dinyayê. Bi nivîskar û şanogerên gelek welatan re li ser metnên şanoyê xebitîm. Ji bo min bû weke dibistanekî ev xebat. Pir tişt li bîra min a nivîsê zêde bû.

Niha jî karim bêjim biqasî romanê min berê xwe daye şanoyê. Û herwiha barê min zêde nekir, heta berevajî paca min firehtir kir. Rê û rêbazên nû li ber min vekir.

Xwendevan an kesên ku bi edebiyatê re eleqeder dibin, gelek caran nasname yan kesayeta nivîsêr didin pêşiya edebiyatê. Mînak çiqas nehatibe tayînkirin jî, ji nivîskarê jin hêviya meselêyê jinanî yan ûslubeke “jînanî” tê kirin. Bi te nasnameyên te çi kurdbûn çi jinbûn tesîrek li ser hîlbijartinê mijarê te an usluba te dike, ev hêvîkirina girtî ya li ser edebîyata te tesîrek çawa kiriye an dike?

Esil keyfa min qet nayê ji cûdakirina “jin û mêra” ya li ser her tişteke jîyanê. Dema dibêjin “wêjevana jin”, “parlamentera jin”, “mamosteya jin” wê çaxê ferqek dixin nava jin û mêra. Lê ev ferq jina mezin nake heta kêma dike. Ji ferasetê em dibêjin qey em taybetiyek didin jinê, na. Ji ber ku wê pênasekirin ji aliyê mêra ve tê kirin. Navenda biryarê ne jin e dîsa mêr e. Ji wan werê ye bi xêra xwe “şananavek” didin me. Bila bi xêra xwe navek, statuyek, şananavek nedin me, jixwe heqê me yê xwezayî ye.

Lê mijara ziman de pirsgirêkek heye. Ew jî çîye? Hema bi mînakeke bêjim. Rojek jinek ji min re helbesta xwe şand. Min dema xwend min dî ez dibim weke ‘mêrek’ û bangî jinek dikim. Wiha; “ey zîn, delala dilê min. Ez memê te me..” Di vir de ez dibim ‘mem’ û bangî zînê dikim. Pişt re ez û wê hevala em peyvîn. Min go çîma tu nabî zîn û bangî memî nakî? Go ez şerm dikim. Aha di vir de haya min ji meseleke din çêbû ku ka jin çawa hatiye çewisandin, çawa ji hebûna xwe ji zimanê xwe yê hebûnê hatiye dûr xistin.

Ne tenê dûrketinê her wiha çawa lê hatiye ku jin ji hestên xwe, ji evîna xwe, ji daxwazên xwe şerm bike û weke mêrek bixwaze bîne ziman. Di vir de pirsgirêkên me hene. Dengê me yê ku di hundirê dilê me de veşartîye divê der bibe weke kaniyan, weke avzemikan. Loma jî min hîlbijartinek kir. Romanên min ên çap-nebûyî ne tê da, lê yên van salên dawîn ên min çap kirin bi her aliyê xwe “jin e”, “dayik e”, “keçik e”. Ev hîlbijartin ne ji bo pênasêkirinê ye. Ev hîlbijartin ji ney-nika civakê ye. Yek ji wan rastiyên hatine binaxkirin e. Bo dengê ku di dilê me de esîr maya bo azadkirina wê ye. An na, bi tu awayê qebûl nakim ku romaneke min li ser “jin”bûna min were pênasêkirin. Afirandin li ser esasê afirandinê divê mere karibe bide ber xwe. Ne ku li ser cûdakirina jinê û mêrê. 21 sal berê min du xelat girt ji du çîrokên senaryoyê. Her du çîrokên min li ser jinan bû. Hemû qerekerên min jin bû. Min ya dilê xwe nivîsandî ye, tişteke ku li ser min hatibe ferzkirin ne bû. Di romana min a “Ev Rê Naçe Bihuşte” de ne tenê jinên kurd jinên ereb jî hebûn. Her wiha di romana min a nûh “Hangar Fünf Deriyê Winda” de- ku hîn çap nebûye, çîrokên jinên efgan û jinên îranî jî tê de hene.

***Tu edebiyata cihanê li ser kîjan kanalan dişopîni? Piştî ku çûyî der-
vayî Kurdistanê xwendinên te hatin guhartin. Te çi dît, çi jixwe guhert
an lixwe zêdekir?***

Nava du sê salan de pir tişt li ba min guherî. Helbet xwendinên min jî guherîn. Vê gavê pirtûkên Doris Lessing û Elena Ferante (rezeyên Napolî) dixwînim. Her wiha pirtûkên li ser dîrok û arkeolojiyê jî. Wêjeya cihanê bi gelemperî li ser malper, kovar, bernameyên şano, malên wêjeyê û malên wêrgêrê ve dişopînim.

***Tu yê nivîsina helbestê bidomîni an te dev jê berdaye? Li ser vê
mesele tu kîjan helbestavanan dişopîni an kîjan helbestvan li ser te
tesîrê kirîye, an dike?***

Ez her dem helbestan dinivîsim. Lê ji bilî du pirtûkên min ên helbestan min pirtûk çap nekirin. A yek “goristana stêrkan” helbestên min ên ciwanîyê ne. Gelek ji wan min 17 saliya xwe de nivîsandibûn. “Derî” jî wextek min xwe jî qereba-lixîya dinyayê dûr xistibû di demeke wiha de min xwest ku çap bikim. Ji bilî van her du pirtûkan di kovaran de di rojnameyan de gelek helbest û pexşan jî hatine çapkirin. Ê jî vana yek jî hîn nebûne pirtûk. Gelek tişt hene ku bûne parçeyeke

jiyana min, min ji wan hez kiriye û bandora wan jî li ser min çêbûne. Her çiqas bandora herî mezin dayika min be jî bo nivîsandinê, di bingeha helbestê de divê kaniyek hebe. Kaniyek ku di kurahiya dil de bikele, ser re biçe.... Baran dikare bibare, li rû û çav, lê heta di dil de nebare nikare bibe helbest. Bo min bandor tenê ne bes e, ez ji wan kesên ku di ruhê xwe de dijî ji wan im. Heta tiştek nekeve dilê min, tê de neji nikare bibe helbest. Lê gelek helbestvan hene him ji wan hez dikim û him jî her daim wan dixwînim.

Gorî cureyên roman, çîrok, helbestê şano hinek di kurdî de qels maye. Lê em dizanin demekî (nexasim li nav kurdên Kafkasyayê) şano pir geşbû. Gelo bi te têkiliya edebiyata kurdî û şanoyê divê çawa be? Çand, erdnigarî, kelapor û zimanê kurdî çi derfet an astengî derdixe li hember şanoyê?

Di kurdî de ji roman û şanoyê bêtir helbest pêşketiye. Sedemên vê yekê gelek in. Di dîroka mezopotamyayê de em dibînin ku li ser lewheyên, li ser keviran bo xwedayan, bo xwedewendan, bo qral û keybanûyan helbest hatine nivîsin. Ger ku em mîna keke bidin, dixwazim mîna Avestayê bidim. Avesta ne tenê pirtûkeke li ser qeydeyên olî ye ligel vê yekê gatayên Avestayê yên ji windabûnê rizgar bûne “helbest in”.

Hinek beşên wê ji bo “Xwedê” hatine nivîsin. Belkî em bibêjin “helbestên ku ji bo Xwedê hatine nivîsin” ne xelet be. Îjar li vê erdnigariyê helbest, çîrok, kilam, gelek pêşketine. Em van cureyana di çarçoveya “wêjeya devkî” de pênase dikin, bandora wan pîranî li ser hestan e. Amûr “guh e, deng e, gotin e, melodiye, rîtm e”. Çi bihîstiyê, çi hîs kiriye hineke din nexşandiye, hineke din lê zêde kiriye û ji nifşekî derbasî nifşekî din kiriye bi rêya şevbihêrkan, dawetan, şînan. Lê şano û roman ne tenê li ser hestan li ser raman û fikrê bandora xwe hene. Taybetiya şanoyê ji ya romanê pirtir e. Ji ber ku roman bi nivîskî ye û amûrê wê tenê çav e (herçiqas niha romanên bi deng hatibe qeydkirin hebe jî). Lê belê şano; zindî ye. Xîtabê çav, guh, dil û mejiyê mirov dike. Loma jî ne tenê bandor her wiha bi mirov dide jiyandin. Wêjeya dinê loma jî şanoyê cihê dike ji cureyên din. Heta weke zanistê lê mêze dikin. Em weke mîletê kurd ji gelek tiştan bêpar mane. Sedemên wê bi sedsalan e heman e. Ew jî dagirkeriya li ser axa me û talan e. Ji ber şer, sirgunî, feqîrî, koç kirin, înkâr kirin, talan kirin û ji xwendin û nivîsandinê bêpar hiştin (tunebûna perwerdehiyê) me ji gelek qadan kêmtir hiştîye. Mijara Kafkasyayê bi rewşa wê demê ve eleqedar e. Bi derfetên xwendin û nivîsandinê, ligel vê yekê derfetên ku wê demê ketiye destê kurdan ve çêbûye. Şanoya Kurdan ya li Sovyeta, Dayika Niştîman û gelek xebat û metnên şanoyê yên wê demê ji dîroka şanoya kurdî re gelek girîng e û bingehê saxlem e. Lê mixabin li gor şertên îro ya dinyayê em gelek ji şanoyê dûr in, bêderfet in.

Şanoya ku li Kurdistanê tê kirin û ên li ewropa tê kirin tu bawer bike nikarim bînim bidim ber hev. Ev ne ji ber qelisî an pirsgirêka şanogeran e. Ez bawer dikim gelek şanogerên serkeftî hene ku ji ber bê derfetî nikarin tişteke zêde bikin. Ev mesele meseleyeke piralî ye. Niha li elmanya hema hema hemû dibistanan de dersa şanoyê tê dayîn. Li her bajareke vî welatî de bi sedan şano hene. Şanoya kilasîk, şanoya modern, şanoya koçberan, şanoya zarokan, şanoya bi zimanên cûda... Weke mijara wergerê, tora şanoyê jî heye û gelek fireh û bi hêz e.

Şano kare ji wêjeya Kurdî pir tişta bigre. Herçiqas niha şanoyên têne wergerandin bêtir balê bikşîne jî, diviya bû bêhtir metnên nû yên kurdî bûbûna şano. Û hin metnên an şanoyên kurdî bi zimanên biyanî bihata wergerandin û di qada navnetewî de bihata lîstin. Lê ji ber ku li Kurdistanê li her bajarî şano tune ye (bi yek dudu nabe) loma jî hin tekiliya wêje û şanoyê bi hev re baş çênebûye. Di vir de qesta min ev e, cihek weke li amedê bê kêmanî deh şano heba li Elihê, li Rihayê, li Semsûrê, li Dêrsimê, li Agiriyê, li Colemêrgê, li Qersê, li Mêrdînê şanoya kurdî heba, li ser van dikên şanoyê bi sedan bi hezaran lîstikvan heba wê metnên romanê, çîrokê bandora xwe çêkira. Erdnigariyeke rengîn û dewlemend, keleporek û zimaneke mezin ji bo şanoyê derfetek e.

Qasî ez dizanim ev demek zêdeye tu nav xebatên cûr bi bi cûr navnetewî da yî, wek nivîskareke Kurd berhemên te ji bo zimanê sereke yê dinyayê tîn tercûmekirin. Tu dikarî hinkî behsa kar û barê xwe ên bi vî rengî bikî, hinkî ser proje û xebatên xwe yî pêşerojê biaxivî.

Xebatên min bi werger û atolyeya helbestan dest pê kir. Pişt re bi qasî du sala bi laboratuvara drama ya navnetewî re min kar kir. Ligel vî yekê di projeyê de şanoya kraliyeta ya shakespeare de (royal shakespeare company) min cih girt. Sala çû meha Gulanê wê promiyera wê çêba. Ji ber coronayê betal bû. Heta kengî û wê çawa were pêşkeşkirin vî gavê nizanîm. Şanoya ku bo Maxîm Gorkî ye min nivîsandibû tenê beşek jê bi dijîtal hate çêkirin. Lê hin bo tevahiya projê, pêşerojê wê çî çawa bibe vî gavê nizanîm. Ji sala çû û pê va Pena-Çek xwest ku bo min bernamêyek çêke, heta niha sê car hate taloqkirin. Di vî bernamê Pena-Çek wê beşeke ji romana “Ev rê naçe bihuştê” bi wergera xwe ya çekî bihata pêşkeşkirin. Monologa min ya “çavê wînda” bi îngilîzî, şanoya min ya bi navê “bîra miriyan” jî bi îngilîzî, elmanî û erebî hate wergerandin.

Dîsa projeyek li ser sedsalîya komara Mehabadê, çîrokeke min ji aliyê weşanxaneyê comma press ji bo îngilîzî hate wergerandin û wê di projeya pirtûka “sedsalîya mehabadê” wê bi îngilîzî îsal were çapkirin. Niha jî hin metnên min bo hin zimanan têne wergerandin. Îsal ger qeza û belayek dernekeve wê romana nû û helbestên nû çap bibin. Ji bilî vana çend projê hene ku ji ber coronayê sekinandî ne û wê kengî pêk were vî gavê nizanîm...